

# DENGË KOMIKAR

Sal : 3  
Wext : 22.12.1981  
Hejmar : 37  
Bîha : 1 DM

KOVARA FEDERASYONA KOMELÊN KARKERÊN KURDISTAN LI ELMANYA FEDERAL

« GREVA ME KUTA BÛ,  
LÊ RIK Ü HÊRSA ME KUTA NEBÛ »

HUNGERSTREIK

GEGEN MASSAKER UND FOLTER  
IN TURKISCH KURDISTAN

GREVA XME

LI HEMBERİ L  
LI KURDISTAN

AÇLIK GREVİ

KÜRDİSTAN'DAKİ İŞKENCE V  
KATLİAMLARA KARŞI

DIXWIZEN ME:

1. Jî be ci da dişya zordestiyän li Kurdistan'a Turkiyê em demasın kumîşgir jî celîx kurdî demografi plavîr û hîzînî li mazîn nûrîvan dixwizan pêşte û em komîşan hîne resevî. Hîzînî temâl bi caven zine vî bîzî.
2. Em demasın hemî dîkariyên li Elmanya Federal li Turkiyê ra dîzîne, hîzînî sekamîşan.
3. Dîzîneyan hemî dîzîneyan bîzî greva bîrçebîpî da ci orhîne em demasîn hîzînî li turkiyî "Plakamentace Europapî" û "Komîşê Europapî" da li 50'inci Kürdîstan Turkiyî hîpeşyîn.
4. Dîzîneyan hemî dîzîneyan bîzî greva bîrçebîpî da ci orhîne em demasîn hîzînî li turkiyî "Barçîstan" û "Plakamentace Europapî" da li 50'inci Kürdîstan Turkiyî hîpeşyîn.
5. Plakîste li Elmanya û li Barçîstan (mazî stardarî fassî) be naskom.
6. Zordestî, Kedan û Tezdayen li Kurdistan'a Turkiyê de parlamentoyle CEF.
7. Jî bîke persa rojî û dîzîneyan sur vî şekîl cîhî.
8. Em dixwizan jî hîmelîn dîdigejhî jîn rovîzînî heyekek pêşte û em hîzînî li Kurdistan'a de demografi pîlîkî, da ci bigar.

2 OCAK 1981

Karkurîn Kurdistanê li dîzîneyan bîzî greva bîrçebîpî da ci gostî



# NAMEYÊN XWENDEVANAN

## Çavşoriya Dijmin Dajo

Hevalên hêja,

Vê havinê ez çûme iznê. Jî Enqerê hetani Dêrsimê li ser me geriyan û çûme gihiştîme gundê xwe. Tuxaya Daxistina Hewa li Qeyseriyê, di zanigeha çandinêye vê hêlê da ciwar bûye û her du aliyê pirê bi tifingan va girtine û li ser herkesi digerin.

Dema ku ez li gund bûm, digotin lesker tênen û li ser me zordestiyê dikin. Kal û piran li me henek dikirin "Kanê ew maociyên weye diqirian, diqijiyan". Ez li ber van giliyan sivik dikeniyam. Bo wê yekê ku em zordestiyen Cuntaya faşist dizanun. Lé tiştên min bi çavê xwe va neditibû, paşı 5 - 6 ê llonê ev yekana ji min ditin. Bo Mêzgir û gundêndorberê wê rojêن 5 û 8 ê llonê rasti rojne reşin. Tuxaya Çiyatiya Bolu ji Urfayê rakirine û anine li dorberê Dêrsimê ci kirine. Qumandarê Taxayê nehiya Nazmiyê par - par qerekol pêkaniye û çek - silahan digere. Di xwaze şuna hevalên şorışvan hinbe, bi zor, sitem û lêdanan va xelqê dikutin.

Di roja 5'ê llonê paşı nivro lesker hatin ketine gundeki Mêzgirê bi navê Karê. Wan qe muxtar û dersdar ji neditin bi wi bayi, qe zmanê dêri ji hilnedan, lêxistin deri şkandin ketne hundirebî dibaştanê. Wê rojê ez bira, dê û pismamên xwe, me xwast ku em herne avgermêkê û me karên xwe serhevda ani. Lé me nihêri çi, texmen destûr derxistiye weki kes ji gund dernekeve. Me nêzkaya 11 roja ereba xwe ji gund derneşit û em ci xwe da man.

Rojtira din sibê seet 9'an da wan hemû jin - mîrên gund evandin. "Me çek - silah xwest, we çuma neanî?" digotin û ew pênc - pênc feleqê girêdan. Hinek wusan hatin kutan ku nîkaribûn rabûna ser xwe û bi ser piştehîn heywanan va çûn malên xwe. Emên ku ji derwayi welat dihatin, ji me ji çekên namlû - dirêj dixwastin. Min bi xwe go te Texmen: "Li Elmanyêzagoneke mexsus derketiye û kes nikare bê destûr çekan bisti-

ne". Lé ew viran va dikenya û digot: "De, de disa te bav û birayê xwera çek anin, derewan neke".

Evana têne gundeki serê mun gewimin. Lé ew gundê ku navê kevn Canik, navê nû Aydinlik... Hemû mîrên vi gundi yek - yek hildan birin. Di roja 6'ê llonê paşı nivro 39 mîrtuji şuna ézingan kirin û ew hetani roja 7'an seet 9'an li wir man. Ne hiştin ew herin abdêşanê ji, nav van da birayê mini 50 sali ji hebû. Terora dewletê wusan mezine ku dûra min çû seri ji neda birê xwe.

Bî xwe ew dibêjin, em li Urfayê gihiştin armancêñ xwe. Li vira hetani em hemû çekan top nekin, em jê dernakevin. Li Dersumê gundan û nehiyan sero bino dikin. Lé ki dikare çekan nede. 3 heb, 5 heb an ji 10 hebin, her çi be bi darê zoreva distin, yênu ku çekên wan tuun jî peran ji wan distin, çekan digerin, lê wan zû - zû nîkarin bibinin. Di rewşeka wa da çek ditin ji tişteki hêsa nine.

Jî êvarê seet 8'an hetani si ve 5'an derketina derva qedexeye, ihtara "Bisekîne" ji na kin, gullan berdîdin mirovan. Royê çi dibêjin Muxtir, ew evaran tê cih. Bi taybeti li ser Riya ku ji Xarpitê berbi Bingo-lê diçê, ser pira "Gülüşkûr" hemû maşinan pêkoldikin. Nemaze maşinênu ku numra plaka wan 62 Dêrsime mirovan peyâ dikin. Kesêni ciwan bi seetan li wir didne sekandin.

Jî gundeki çuyina gundeki ne tişteki hêsaye, li cikê mîvan mayin, bê destûr nabe. Di roja 25 llonê min xwast bi erebê va herim gundê Dêrsimê "Geyik Suyu" û, ser daxwaza hevalên mine karker li vêderê minê serik bida wan. Mixabîn, nehiştin, rîda ez vege randim. Di roja 29'ê mehê da ez çûm disa rî nedane min û bêditin min lêxist ez hatim. Disa di navça Dersimê da çend lojman bi zorê valakîrin, zabîten nû hatin ciwar bûn.

Silav ji we ra.

Jî Hamburgê ....

## Se-Kuçikêñ Gerok

Jî Dengê KOMKAR'ra,

Ez sempatizaneki KOMKAR'ım û li bajarê Hammê di minim. Min roja 28.11.1981'da hevaleki ku ji Kurdistanê Trkiye hatibû dit. Wi hevali rewşa Kurdistanê usa ani zman:

"Ez ji bo du mehan çûme Dêrsimê iznê. Ez çûme gundê Kabayel û Kirdim yên ku grêdayîyen Plümûre ne. Hewa sar bûn û berf dibariya. Rê û dîrb girtibûn. Bi frondayan (Helikopter) leskeren komando hatin û avetin ser gund. Leskeren Komando mal bi mal digerian. Bi maniya "Lê gerina anarşist û çek - silahan" malan digerian, hemû mitêl û tıstêñ hündirên malan komdikirin davetne derva, ser berfê. Bi manaye lêgerina çek û silahan nîvin û mitêlén gundiyêñ Kurd diçîrandîn û dişewitandin. Mêr li rasta gund

da komdikirin û ew tazi dikirin. Bê ji hev cudadırına jin û qiz gişt tazi dikirin li ber çavén mîran.

Leşkeren komando yênu ku li Qeyseriyê leşkeriyê hindibin davetne ser hemû bajar û gun den Kurdistanê. Navça (merkeza) komandojê bajarê Qeyseriyê ye. Leşkeren faşistên komando digotin ku: "Moskova ji bê kesek nikare we ji destê me derxe".

Ez pir bajarê Kurdistanê geriyam. Hemû ci tijeye bi keran va.. Lé di çuyin û hatina min da li rojava (Tirkiyê) da qet tişteki usa min nedît."

Ez vê ditim û gotara xwe ji Dengê KOMKAR'ra dînivisim. Hêvi û gumana min ewe ku hemû meriyêñ welatparêz bi vê yekê behesin.

Bî silavêñ germin.

Jî Hammê ...

## Gelê Me Jî Destê Leskerê Türk Zare - Zare

Di roja 15'ê Tebaxê da cendirmê ser gundê "Afsin Keşanlı" da girtin. Berê jin-zar, kal - pir meydana gund da komkirin û paşê başçawus ji gundiyân çek - silah xwest. Malê kê da silah hene pêviste hildin binin, got. Dema gundiyân: "Çek - silahê me tûnîn" gotin, başçawus vege riya ekereki got: "Mira Heyder binin". Lezeki şunda me nihêri esker bi gelek şiv û singan va hat, empareş têgîştin ku van ra got "Heyder binin".

Di gunda hemû kes ji feleqêda derbaz bû. Paşı vêya başçawus li nêzkaya gundê me çiyak nîsan da û "marş - mars" destûr da. Lesker li her aliyârez bibûn, û yênu ku li lez nedrevin, ew dihatin kutanê. Di gundê me da jîneke duçan nîkaribû bireviya û ji ber lêdanen ew hat kuştin.

Paşê disa em li meydane hatin evandin. Paşı Kome!

Democratik ku berê li ghebû, şuna wê bîmasinanva sero - bîno kîrm. Carte din ew ji feleqê derbazbûn û leskerâ ji nîn gundê me birin bi namusa wan ya listin. Paşê vedgeriyane me "Bila Unis diya we ..., eme diya we..."

Li gundê me qerekol sazikirin. Hemû mal yek - yek geriyan. Li malê wanda ku silah tinebûn, gef - gûren xwe zêtir dikirin: "Jî te ra du roj wext, yan ji ezê te bikûjîm" ji gundiyan hinekan ji derne din çek bi pereti stendin anin dane leskeran. Bi navê Xelil Erdem gundi ki silahêk stendibû dabû leskeran û ser da ji ew disa hate girtin ku "ew silaha ser xwe digerine".

Wextekê li gundê me makosteki ji Dersimê hebû. Ew kutan û gotin em divine nehiye. Lé hela negîştin nehiye rî da ew ji ber lêdanen hate kuştin.

# GREVA XWEBIRÇİHİŞTİNÊ

## BI SERFIRAZI KUTABÛ

"... Ev berxwedana me wek kumekê nav çavê Cuntayê ket û Cuntayê derbeke xeder xwar. Vir şunda ji emê van derbêñ xwe zêde bikin û tekoşina me wê bajo."

Kes û rêxistinê pêşverû, demoqrat! Ew greva ku me di roja 2.11.1981'an da li hemberi zordesti û qırkırinê li Kurdistana Tirkîyê despêkiribû, iro kete 41 rojan û em vê grevê kutadikin.

Ev berxwedana me gihîste armancêñ xwe. Zordesti, lê dan û tevkuştinê li Kurdistana Tirkîyê bi sedhezaran belavok, bi deh hezaran plakat û bi gelek civinêñ presse va li Elmanya Federal û li hemû hêlén Ewrûpayê hatin diyarkir û guhdarkirin. Li hemberi Cuntaya faşist balkışandineke fire hate pêkanin, kes û rêxistinê deqrat piştgirtiya me kîrin. Nêzkaya 200 zib, komel û rêxistin bî çalaki û bî aktifi alikariya me kîrin. Bi hezaran kesen pêşverû, nav wan da dadimend, niviskar, senetkar, zane û parlamenteñer ji hebûn pişta me girtin û em tenê nehiştin.

Press, ajansên deng û behsan, radyo û televizyonê li Elmanya Federal û li welatêñ Ewrûpayê mayin şuneke fire dane grev û daxwazêñ me.

Partiya Demoqrata Kurdistana İran (PDK-İ)-Beşê Ewrûpa, Yekîtiya Niştimanê Kurdistana (YNK)-Beşê Elmanya Federal, Partiya Demoqrata Pêşverûyê Kurdistana Sûriyê (PDPKS)-beşê Ewrûpa û Partiya Sosyalist a Kurdistana Tirkîyê (PSKT) li gel vê xebata me piştgirtiya xwe nişandan.

Dî destpêkê da karkerêñ endamên KOMKAR, komelêñ wan û kes, rêxistinê pêşverû-demoqrat li derwayi welat bi dilgermi pişta me girtin. Ser vê yekê karkerêñ KOMKAR li bajarêñ Stuttgart,

tmund, Paderborn, Duisburg, Nürnberg, Wuppertal, Bremen û li Stockholm

rûniştin grevne xwebirçılıştinê demkurt.

Jî rêxistinê Tirkâ yên demoqrat hinekanji me ra mesajên piştgirtiyê rêkirin.

Li Ewustralya, Amerika, Misr, Yewnanistan, Frense, Norveç, Swêd û li gelel welatêñ mayin karkerêñ Kurd û Tirk bi telegramê piştgirtiyê û bî bexşîşen xwe va dengê xwe bilind kîrin.

Bî sedan karkerêñ Kurdistan, bî zarzeçen xwe va herro hatin seri dan me û xebata me xurttir kîrin.

Kes û rêxistinê ku piştgirtiya me kîrin bî pereti li ser kontoya me 25.000 DM rêkirin.

Pâsi piştgirtina hêzên demoqrat û alikariya wane aktif û jî ber berxwedana meye bawermendi piraniya daxwazêñ me hatin cih:

Dî nav wan da dadimend, niviskar û zanayêñ navdar bîryar girtin, ku dî nav wê komisyona ku here Kurdistana Tirkîyê da ci bigrin. Ev komisyona nealigir wê rewşa Kurdistanê ci da bibine.

Parlementoya Ewrûpê û Konseye Ewrûpê ji grevkaran va heyetekê va peyivin. Wan qebûl kîr, ku wê li ser daxwaz û pêşneyarêñ grevkaran bisekinin.

7 Parlementerên Elman pişta me girtin û jî bo daxwazêñ me alikariyêñ xwe nişandan.

Hukumeta Federal, dayra şuxûlêñ der dîmîre û Televizyona Elman 1. û 2. (ARD - ZDF) li ber daxwazêñ me bêden-giya xwe ajotin.

Iro ji ber baweriyyê politik û jî ber ku ew Kurdin mirovên me zordesti û cezayêñ mezîn dibinin, li Elmanya Federal ji bo van mirovan mafê starbûnê (iltica)

hin ji nayê naskirin. Ew kesen ku ji Cuntaya faşist ra bî sed milyonan DM alikariyan dikin û li hemberi gelê me ewen pişta Cuntayê digrin, xwe ji wusana mirov nikare tişteki zêde ji wan hêvi bîke. Lî kes û rêxistinê pêşverû wê zora van hêzan bibin û hukmê wan wê ser van hêzan zede be.

Karkerno,

Mirovên pêşverû û niştimanperwer!

Leşker û komandoyen Cuntaya faşist iro li Kurdistanê li ser gund û bajarêñ me da zordestike bêhempa dajon. Lî bestêñ gundan da jin, zar, kal-pir cûda nakin hemûyan dîdin ber lêdanen û wan qirdikin, usa ji Cunta li ser demoqratêñ Tirk, çina karkeran û li ser hemû hêzên diji faşizmê erişen xwe zêtir dike. Ev Cuntaya noker bi navê hêzên emperyalist û burjuvaziyê çav berdaye keri nanê gelên Kurd û Tirk.

Jî bo rûteni û rûreşa vê diktatoriya faşist nişan bikin, li ser karêñ diji mirov-tayê vê Cuntayê nasbikin, zor pêviste hemû hêzên diji faşizmê li derwayi welat bixebeitin.

Em 23 karkerêñ Kurdistanê di nav 41 rojan da birçi man û bo hovitiya vê rejimê, me ew sosret û protesto kîr. Ev berxwedana me vek kumekê nav çavê Cuntayê ket û Cuntayê derbeke xeder xwar. Vir şunda ji emê van derbêñ xwe zêde bikin û tekoşina me wê bajo. Hettani ku kingê gelê me dawiya vê sazumanâ faşist ani, ev şerê me wê bimeše.

Greva me kuta bû, lê nk û hêrsa me kuta nebû!

Bimre diktatoriya faşist û kolonyalist!

'Bi ji berxwedana meyê 41 rojan!

## SERSALA WE PIROZ BE !

Xwendevanêñ hêja,

Me disa salek paşa hişt û em dikevne saleke nû. Em sersala xwendevanêñ xwe piroz dikin û jî wan ra dî sala nû da serfirazi, pêşketin û dîlşahiyêñ mezîn hêvi dikin.

Xwendevanêñ delal,

Azadi û rizgariya gelê me ji bin nirê kolonyalizmê li herçar perçen Kurdistanê roj bi roj pêşta diçe. Dî vi wari da sala çûyi ji bo gelê me sala şer û dewa bû. Ev şer iro li ser rêke sosyalist û rast da dimese. Him û

bîngehêñ sazûmanêñ kolonyalist û kevneperest di şuna xwe da dileqin, dîlivin û ew berbî hîlweşandmê diçin. Li pêşîya gelê me ji sal bi sal deriyêñ azadiyê vedibin, dî nav van qeliştikan da tîrêj û pençen roja sosyalizmê davêjne li ser welatê me. Tu kes, tu hêz nikarm pêşiyê li vê quwetê bigrin.

Tîrsfirandina hêzên emperyalist û gef-gûrên burjuvaziya yekdest vê salê ji ajotin. Ew dî nav xwe da ketine leceke çek-silahêñ atomik. Aşı-

ti-edlaya hemû cihanê iro rêke teng û dijwar ra derbaz dîbe. Lî em bawer û hêvi dikin ku hemû mirovên aşitixwaz, azadixwaz û hemû mirovên dîlpak wê pêşîya vê rê bigrin. Mirovtayê wê bî rûken, rûgeş û wê bî serbesti biji.

Em carke dîn sersala we piroz dikin, rîyêñ fireh û saleke xêr û xweşî ji we ra dixwazin.

Redaksiyona  
Dengê KOMKAR



# DENGÊ PIŞTGIRİYÊ LI ELMANYA FEDERAL HER CÛ BILIND BÛN

Ew greva xwebirçihîstînê ku 23 bra-der û heval tê dane ji aliye karkeren Kur-distanê dî piştgirti û guhdarike mezin dit. Gelek karker dor bî dor, qelfe - qelfe cihê grevê ziyaret kîrin û piştgirtike bî can û bî mal nişan dan. Bî taybeti dî rojên hêsa-bûnê (tatil) da cihê grevê bî mirovan va dîkumkimi. Kesên ku ji der dihatin, bî grêvkaran va govend digerandin û bî hevra klam - stran digotin. Ev ciyê grevê bî xemla cejnekê va te digot neqîsiye.

Lê mirovên meye karker alikari û piştgirtiya xwe ne tenê li ciyê grevê, usa ji li gelek welatê Ewrupayê din nişan dan. Lê bî taybeti wan karên xwe li El-manyê fire kîrin. Dî nav şêni - mirovên Elman, Türk û Kurd da daxwazên vê grevê û zordesti - terora li ser welatê me yek - yek hate şirovekirinê.

## RÊXISTINÊN KURDISTAN PIŞTGIRİYÊ DIKIN

Komelên demokratik yên Kurdan piştgirtiya grevê kîrin. KOMKAR, AKSA û Komita Avakîrîna Komela Jinê Kurdistan bîyîr gurtin weki bî aktifi û çalaki piştgirtiya vê grevê bikin. Ser van bîyaran wan paşê karên xwe zêtu kîrin. Ji ber vê yekê wan cihênu ku komel, komite û sempatizanê wan lê ne;

- Bî sedhezari belavok Türkî, Kurdi, El-mani û Frensizi hatin belavkirin.
- Li gelek bajarê Elmanyê plakat hatin dardakîrin.
- Bî komelêni bîyaniyan û bî mirovên pêşverû û demokratva gelek peywendi hatin pêkanin û ji wan ra li ser zordestiyen fasist û nijadperest li Kurdistanê hate dengkirin û piştgirtiya wan hat xwestin.
- Hevalê me cûn li bal mirovén nişti-manperwer û li ser rewşa welatê me bi wan va peyvin û hevalan xwest ku ew piştgirti û alikariyê nişandan.

## KAREN PIŞTGIRİYÊ DAJON

Greva piştgirtiyê ku li Swêdê hate çêkîrin, faşistên vi welati eriş birine ser grevê, lê karkeren Kurdistanê ber vê êri-şê xurt rawestan û ew kutan beri wan dan.

Greva li Swêdê li vi welati dengê xwe baş da bîhîstandin. Televizyonâ Swêd, gelek radyo û rojnamên navdar ser grevê gele nûçe weşandin û şuneke fire dan grevê. Pir sendigan, komelêni demokratik û gelek mirovan ji bo grevê alikari û piştgirtiya xwe nişandan.

● Ew greva piştgirtiyê ku beri çendeki bî destê sempatizanê Komela Karkeren Kurdistan li Stuttgarte despekirîtu bî serifrazi kutabû û paşi vê yekê ji xebat hatin ajot. Ji nûva bî hezaran belevok hatin belavkirin û palakat hatin derxistin. Li navça bajêr û li gelek hêlén li dorberê bajêr, mal, karxane û şunê xwendekaran heva-

lan ziyaret kîrin û li ser grevê wan ra peyvin. Jo bo grevkaran li vê hêlê kampan-ya ke bexşisan hate vekîrin.

## FRANKFURT

Ji bo wê yekê ku ew grevê li bajarê Frankfurtê daninê, Komela Karkeren Kurdistan, sempatizanen wê, AKSA besê Frankfurt û Komita Jinê Kurdistan di despêkê vîrda şev û rojên xwe kîrin yek, dest bî xebatê kîrin.

Karkeren Kurdistanê bî jun û mîr ji aliki da ji bo rîbirina karen cihê grevê, bo cihanina hewcedariyên grevkaran, ji aliye din da ji bo propagandaya grevê di nav xelqê da gelek kar kîrin.

- Bî hezaran afîş hatin dardakîrin.
- Ser 30 hezari belevok hatin belavkirin.

● Hevalan komelêni demoqratik, yên Alman, Türk û Kurdan ziyaret kîrin, ser daxwazên grevê wan ra peyvin û piştgirti ji wan xwestin.

● Dî meşîna ku diji firekirina balafirgeha Frankfurtê hate çêkîrin, gelek karker û xwendekarê Kurdistanê tevi wê bûn û bî gelek riyan va besdareñ vê meşînê li ser vê grevê agahdar kîrin.

● Beşa AKSA li Frankfurt di Zaninge-ha Frankfurtê da pircaran quncikê pirtukan vekir.

● Disa AKSA beşa Frankfurtê, li bajarê Wisbadenê tevi meşînekê bûn, dî wê meşînê da nézikê 150 hezar mirov besdar bibûn. Wan belevok belavkirin û bî dengbilindirê va besdar li ser greva Frankfurtê agahdar kîrin.

● Li bajarê Frankfurt xiret û camêriya karker û xwendekarê Kurdistan ji ber çavên grevkaran nerevin û vê yekê morale grevkaran bilind kîr.

## DORTMUND

Pasi despêkirina greva Frankfurtê Komela Karkeren Kurdistanê û AKSA'yê mil dan milê hev û li vê hêlê gelek karên piştgirtiyê qedandin.

Dî nav xelqêda ji bo guhdarkirina greva xwebirçihîstînê wan dest bî propaganda mezin kîr, 22 hezar belavok belavkirin û gelek plakat dardakîrin. Xêni ji van karîn gelek komel û mirovén pêşverû hatin ziyaret kîrin.

Ji bo piştgirtiya xwe li gel greva Frankfurtê nişandin, ew ji di roja 19.11. 1981'an da bi 7 hevalan va tevayı cûne greva xwebirçihîstînê. Li ser vê greva demkurt, du rojnamên vê hêlê da deng û behs derketin. Di dawîya grevê da ew li Dortmundê tevi meşînekê aşitîyê bûn. Disa di wê rojê êvarê şevekê da ji grevkaran 3 kes bi hevalan va cûn besdar bûn, wan quncikê pirtukan vekir û belavok belavkirin. Dî şevê da wekilmîletê SPD - Manfred Coppik ser greva Frankfurtê sekini û Coppik di axaftuna xwe da

piştgirtiya xwe diyar kîr. Televizyonâ paşê şun da vê axaftuna Coppik. Kampanya ku bo bexşisan hatiye vekîrin, he-la hê dajo.

Komela Karkeren Kurdistan li Hamm ku bî aktifi li dor berê xwe dixebite, li xwebirçihîstîna Dortmundê da ji wezife girt li ser mulê xwe û xebateke kîrhati pêkani.

## MÜNIH

Endam û sempatizanen Komela Karkeren Kurdistan li Münih di destpêka grevê da hetani niha bî awaki aktifi va dixebîtin. Ji bo armanc û daxwazên grevkaran here sêri bî awaki kîrhati û jê hati va hele-queti û peyvendiyê xwe bi komelêni dî moqrat û karkeren Kurd ku li der doi. Münihê dixebîtin ra xurttir kîrin. Wekê praniya bajar û gundên Elmanyâ li bajarê Münihê ji bî dehhezaran belavok hat belavkirin, plakat li diwaran hate xistin û kampanya alikariyê hate vekîrin.

Dawiya van xebatan Organizasyona (komela) Efkirinê ya Navnetewi (AI) Lî-qê Münihê ji bo grevkaran şevekê piştgirtiyê pêkani. Çend roj beri şevê evê komelê (AI) belavokek ji çapkir û belavkir. Di belavok û da zilm, teda û terora ku li ser gelê Kurd tê kîrinê bî awaki eşkere va hatiye nivisandin. Ev şev 3.12.1981'an da hate çêkîrin. Dî şevê da nézikî 200 meri besdarbûn. Dî programa şevê da hevalek ji Birêvabirina KOMKAR'ê da û berpîsi-yarê Komela Efkirinê ya Navnetewi (AI) hqê Münihê ku dirêj li ser diroka Kurdistan û li ser zilm û terora njadperesten faşist ku li ser gelê Kurd dajo, hate seknan-din.

## PADERBORN

Endamên Komita Karkeren Kurdistan li Paderborn destpêka grevê vîrda bî awakê zanisti û bawermendi va kar û xe-batêni xwe pêşşa birin. Pîrsen welatê me, zilm û çetinayıya ku gelê me dîbîne yek bî yek ji golê Paderbornê ra eşkere kîrin. Destê xwe direjî piştgiri û alikariya demokrat û pêşveriyê der dora Paderbor-ne kîrin.

Endamên Komitê ji derê belavok belavkirin, plakat lêxistinê, çûyin serdana komelê û mirovan; usa ji ji bo piştgirtiya grevkaran bajarê Frankfurtê 2 roj greva xwebirçihîstînê li bajarê Paderbornê pêk anin. Grevê di 26 - 27.11.1981 da çêbû. Yêni ku di grevê da ci girtin 5 kesên xe-batkar bûn. Ji wan sê kes Kurd, yek Türk yê din ji Yewnan bû. Ev grevkaran kû ji teher - teher miletan hatibûn cem hev, nimunek ji piştgirtiya internasyonali ye.

Greva xwebirçihîstînê li navça bajêr (orta bajêr) "Fussgänger Zonu" da destpêkir. Karkeren di nav rastê (meydanê) da koçen (cadır) xwe serrast kiribûn, hati-na ba baranê û rabûna babeliskê karkeren

ji armanca wan dûr nedixist. Gelê bajê r bi kom - kom dihat seridän grevkaran. Gelek parti, komelên demokratik û mirovên pêşverû piştgiriya grevê kîrm. Gelek roj-neman di nav rüpelên xwe da ciyeke fire dane vê bûyerê.

Rêkxiravên ku piştgiriya grevê kîrm evbûn: Komela Karkerê Xwendekarêن Yewnan, UNISA Komela Meriyen Afrikê, Yekitiya Xwendekarên Bîyani (ASV), ji komelên cuwanê Elman JUSOS, MSB, DKP (Partiya Komunist a Elmanyê) û SDAJ (Karkerên Civan yê Sosyalist a Elmanyê). Ji van komele û mirovên pêşverû gelek mirov ji bo pêşvebirina vê bûyerê di nav vê yekê da ci girtin. JUSOS'an (Xorten Sosyalist) bangî gelê bajêr kîrm ku, Tirkiya weliteki bî NATO'yê va grêdaye û bî destê vê dewletê teroreke nediti li ser gelê Kurd tê kîrm, pêwiste li diji alikariyên Tirkîyê bê derketin.

Li ciyê grevê xebatkarên Elman, Kurd, Tirk, Yewnan û ji gelek miletên din stran û marş digotin.

Seroke SPD - liqê Paderbornê bî bevkirina belavokekêva piştgiriya grevê kîrm. Yekitiya Xwendekarên Protestan (ESG) ji wezirê derive yê Elman Genscher ra namek nivisand û Cuntaya faşist protesto kîrm.

Ji derê rojnameyan, Ajansa Xeberên Elmania (DPA) ji di ciyê grevê da bî grevkaran va dan ûstanek (roportajek) çê kîrm. Karkerên Werl û Komita Azadiyê li der dora Gronau yê bî şandina mesajan va piştgiriya grevê kîrm.

Dî dema grevê da karkerên Kurdistan yê ku li der dora Dortmund û Hagenê dixbitin ji alikari û piştgiriya grevê kîrm.

## BREMEN

Ji bo greve Frankfurtê Komela Karkerên Kurdistan li Bremen û AKSA bî aktifi û çalaki tevi xebata bûn û piştgiriya greva Frankfurtê kîrm, sempatizanên komelê bî xwe ji cûn greveke demkur. Ser

yelek komelên pêşverû, komelê Alman, Tirk, Kurd, mirovên demokrat û gelek malbatén zehmetkêşan ji alyî hevalan da hatin ziyaret kîrm, ser grev hevalan ew agahdar kîrm. Paşa van xebatan ji bo piştgiriya greva Frankfurtê Komitek hate damezerandin. Ji gelek netewan mirovan di vê komitê da ci girtin.

10 kes ji Kurdistana Tirkîyê, 3 kes sempatizanê Partiya Demokrata Kurdistana Iranê û yek ji ji Kurdistana Iraqê, 14 kes di roja 1.12.1981'an da li Übersee Museum da cûn greveke xwebircihîstînê.

Dî roja pêşin da civineke presê (xeberan) hate pêkanin. Dî wê rojê disa Televizyonê hêla Bremenê û Radyoya Bremen li ser grevê deng behs weşandin. Dî radyoyê da helbesta Kemal Burkay bî navê "Serhildan" bî zmanê Almani hat xwendin.

Gelek komel û mirov hatin serik dan suna grevê û bî mesajan va piştgiriya xwe nişandan.

## HAMBURG

Komela Karkerên Kurdistan li Hamburg û endamên Komita Ciwanari li Alte-

land wek karkerê xwendekarên cihê din bî aktifi gelek karên piştgirtiyê ajotin.

Endamên komelê di nav xwe da ji bo alikariya greva Frankfurtê komitek sazkitin.

Ji aliye din lî diji mehkema 52 serkaren DISK'ê, ji nûva despêkirina greva Helmut Zander ra alikari û piştgirtiya mezin hat nişandin. Endameki vê komelê bî Helmut Zander va tevayı cû grevê.

## DUISBURG

Paşa destpêka greva bajare Frankfurtê, sempatizan û endamên Komela Karkerên Kurdistanê li Duisburg, li dörberê wê hêlê di nav xelqê da ser destpêkirina greva Frankfurtê bî tehreki fire ew guhdar kîrm.

Paşa wan di nav xweda bîryar girt ku wek gelek bajare din ji bo xurtkirina piştgiriya greva Frankfurtê grevekê din destpêbikin. Ser vê yekê gelek komelê



politik û demokratik va peywendi hatin girêdan û bî gelek mirovên pêşverû ziyaret kîrm.

Dî roja 24.11.1981'an da dera (kilia) bî navê Salvator hate zevtkirin û li vîra 6 hevalan di nabera 3 rojan da greveke piştgirtiyê daxistîne ortê. Ser destpêkirina grevê rojnamevan û serkarêne televizyonê hatin agahdar kîrm. Nûçeyen li ser grevê bî şikl û suretanva di rojname 'RP' da hatin çapkirin û di nav nûçeyen xweda Radyoya WDR (Radyoya Elmania Rojava) sünd da vê grevê.

Berpirsiyare DKP'yê (Partiya Komunist a Elmanyê) li vê hêlê hat suna grevê ziyaret kîrm û bî mesajekê va piştgiriya xwe diyar kîrm. Disa rôxistina ciwanan FALKEN piştgiriya vê grevê kîrm.

Rêxistinê Tirkîyê û Kurdistanê KUK, PKK, Dev-Yol (Rêya Şoreşi), Tekoşin, Dev-Sol (Çepa Şoreşi) û sempatizanên KSD (Rizgari-Kovara Sosyalist) bî komî kom hatin serik dan hevalen grevkar û piştgiriya xwe diyar kîrm.

## NÜRNBERG

Ji bo cihanina greva Frankfurtê û bo dengê grevkaran li cihanê bê belavkirinê, di nav komelê grê dayiyen KOMKAR'ê da Komela Karkerên Kurdistan li Nürnberg ciki here bilind digirt. Him cigirtina nav greva Frankfurtê da him ji xebatên ku li der dora Nürnbergê dihatkirinê da, endamên KKK li Nürnberg bî aktivi xebitin. Ji bo grevkar bigihijine ser armanca xwe bî mîrxasi û jehatiyekî mezin va xebitin.

Ji bo piştgiriya greva Frankfurtê, endamên KKK li Nürnberg 'Komitekê Piştgirtiyê' pêkanin. Komitê ji 20 hezari zêtir belavok bî zmanê Elmani, Turki, Kurdi belavkir. Ji hezari zêtir plakat zeliqand. Ji bo belavkirina deng û behsên grevkaran di nav bajêrda stan (masê informasyon) vekirin.

Komitê bîryar girt ku grevekê xwebircihîstînê ya kurt li Nürnbergê pêkbine. Roja 27.11.81'da gurubekê ku ji 5 Kurdan û 3 Elmanan pêkdihat büroya Partiya Keskan (Die GRÜNEN) zeft kir û ji bo sêrojan dest bi greva xwebircihîstînê kir. Ewê rojê da li ciyê grevê civineke pressê hat çêkîrinê. Agahdari bî belavokên hazırları hat belavkirin di nav rojnemevan û acansan da.

Bi saya xebata aktiv û kîrhati 29 komele, parti û rêkxavên demokratik piştgiriya grevê kîrm. Bi imza van rêkxavan 3000 belavok bî zmanê Elmani, 500 ji bî zmanê Tirkî hate çapkirin û belavkirin di wextê berdewama grevê da berpirsiyaren ASTA (Yekitiya Xwendevanen Universitan li Elmanyâ), Yekitiya Komûnistan li Nürnberg (Kommunistische Bund), Koma Amerika Latinî li Nürnberg, Komela Welatparên Kurdistan, Yekitiya Demokratîn Tirkîya hatine ciyê grevê û mesajên piştgirtiyê xwendin.

Mebûsê SPD'ye meclisa eyelata Bayiera Langenberger Wolf seriyeke da grevkaran û ji wan ra slavên mebûs Renate Schmidt pêşkêş kir.

Di 'Şeva Piştgirtina Tirkîyê' ya ku li Nürnbergê hate çêkîrinê da belavoka greva xwebircihîstînê bî zmanê Elmani û Tirkî hate xwendin. Di şevê da gotin ku pêwiste piştgirtin û alikariya vê grevê bê girin.

Komita grevê pêwendiyen xwe bî rêkxav û meriyen ku li ser mafêni mirovâtî mijüldibûn ra xurt kir. Ji wan rêkxav û meriyen ra rewşa Kurdistanê ya iroyin, teda û lêdanên ser gelê Kurd hate şirovekirin. Bi saya sere van xebatan, li Nürnbergê di dêra protestan da wextê destpêkirina seminara 'Hefta birçityê ya cihanê' da keşîşê dêrê bûyêr û rewşa Kurdistanê hani zman û bangê kesen ku di dêrê da besardibûn kir û got: 'Verin em du a bikin, ku gelê Kurd yê ku li Tirkîyê di bin zilm û tedâyiyeke mezin da ye, ji bo di civineke azad da biji; û ji bo girtiyen ku di zindanan da ne jiyineke bê te da û bê lêdan biborinîn.'

Roja 30.11.1981'ê da Radyoya Bayiera xebera greve da bîhistin. Ji dêrê vê yekê ji rojnameyan Nürnbergê Nachrichten, Nürnberg Zeitung, Grüne Specht û kovarê Plerar û Gostenhofer Blat ciyek fire dane xebera greva xwebircihîstînê.

## Mesaja PSKT'ye

Karkeren KOMKAR yén Grevkar ra,  
Frankfurt

Ji aliye karkeren KOMKAR'ê da destpêkirina vê greva xwebirçihîştinê ya biraderan di demeke wusan da despêkir ku, hukumeta faşist li Kurdistanê zilm û zordestiyen xwe hin ji zêtir kiriye. Leşkeren kolonyalistan û polisên wan li ser gelê me yê belengaz jin - zar û kal - pir nabêjin hemûyan didin ber lêdanen, rûmeta mirovatiyê di bin piyan da pêpes dike.

Karkeren KOMKAR'ê yén mérkas!

Zêdebûna hovitiya kolonyalistan bê sedem nine. Wan bi salan hetan salan welatê me şelandin, tekoşina azadiya gelê me di xwinê da hiştin û cedandin vê tekoşinê bindestkin; wan xwest ku mirovén me dil bigrin û canda me bîhelinin. Lé ew ne gihiştin daxwazên xwe û sosret bûn. Gelê me berxweda. Agirê azadiye di nav gel da hin ji geş bû. Dijmin iro ji ber bilindbûna tekoşina gelê me şaş - metal maye. Dijmin kîras ji rûyê xwe kîşand û wek guran dîranê xwe nişan dide.

Lê ev riya xelasiyê nine ji wan ra! Ew nikarm daxwaza bi milyonan kesan ji bo azadiye ji ortê rakîn û rê li tekoşina wan bigrin. Gelê me dijmin iro baştıri nasdiye. Li hemberi wan, rik û hêrsa gelê me mein dibe û roj ne durin ew binkevin.

Brayen grevkarên mérkas!

Dî vê dema ku ev ewrê reş dagirtiye li ser gelê me, berxwedana we, wê tekoşina me xurttr bîke. Li Kurdistanê mirovén meye ku dil-cegera wan dişewite iro dîbinin ku ne tek-tenê ne. Ev yeka wê pişta wan qewim bike. Ev berxwedan wê dengê gelê me li hemû cihanê bîde bihistin û wê zora dijmin bibe, weki dijmin tîkeve ber destan.

Partiya Sosyalist a Kurdistanâ Tîrkiyê li bal we ye.

Bîvî - nevî emê zora dijmin bîbin!

Rojen têñ, yén me ne!

bî navê  
Partiya Sosyalist a Kurdistanâ Tîrkiyê  
Sekreterê Giştî  
Kemal BURKAY

## Mesaja Partiya «Keskan» Die GRÜNE

Komita Grevkarên Xwebirçihîştinê ra!

Partiya "Keskan" (Die Grüne) û Birêvabırına Giştî li hemberi eziyet û lêdanen Cuntaya faşist li Kurdistanâ Tîrkiyê piştgirtiya daxwazên karkeren Kurd û greva wanê xwebirçihîştinê dûke.

Partiya "Keskan" dixwaze ku derhal Tîrkiye vegere ser sazumana demokrasiyê, emê vê daxwaza xwe ji NATO'yê û Emerika Yekbûyi ra ji rê bikin.

Serketin ya me ye!

bî navê  
Birêvabırına Giştî  
Petra KELLY

## Mesaja Xwendekarêñ Filistin

Komela Xwendekarêñ Filistin

Ji Grevkarên Xwebirçihîştinê ra!

Em bî navê xwendekarêñ Filistinê yén ku li Elmania Federal dîminin, li hemberi Cuntaya faşist li Tîrkiyê tekoşina we da em li bal wene û piştgirtiya we dîkin.

Em piştgirtiya hemû daxwazên we dîkin û bangî hemû hêzên demokrat dîkin ku li hemberi zordestiyê li bal we bin.

Biji piştgirtiya internasyonal!

Birêvabırana Giştî

## CEND MESAJÉ

## Mesaja FARABUNDO MARTÍ

Ji Komita Greva Xwebirçihîştinê ra,

Heval û hogirê delal!

Ez bî navê gelê El Salvador, hêza wêye pêşeng - yekbûyi Eniya Şorîşvane Demokratik û Tevgera rizgariya Netewi Farabundo Martí we hemûyan bî dilgermi silav dîkim û piştgirtiya tekoşina we dîkim.

Çawa li welatê we, usa ji li welatê me ji bî destê Emerika Yekbûyi hukmê diktatoriyeke leşkeri dajo.

Em piştgirtiya daxwazên we dîkin û serketinê wan dixwazin.

Bî silavê piştgirti.

Bî navê Eniya Şorîşvanê Demokratik li El Salvador û bî navê Tevgera Rizgariya Netewi - FARABUNDO MARTÍ Telagrafa nûnerê wan li Elmania Federal, Leonardo Uzquiano.

## Mesaja Komita diji-İmperyalizmê û Piştgirtiya gelên Asiya, Efrika, Emerika Latin

Grevkarên Xwebirçihîştinê ra!

Hevalên hêja!

Ez dixwazim we bî navê Komita Diji-İmperyalizmê bî dilgermi silav bîkim.

Em li vê xebata we bî sempatike mezûn dînhêrin û serketinê pê dixwazin.

Em bî we va tevayı diktatoriya leşkeri li Enqerê protesto dîkin, li hemberi vê rejîma paşverû hemû kesen ku şer dîkin, em piştgirtiya wan dîkin.

Alikariyên NATO û bî taybeti alikariyên Elmania Federal ku li vê rejîmê ra rê dîke, em hemberi wan in.

Tekoşina we, perçeve ji tekoşina gelan ji bo demokrasi pêşketinê civaki.

Carke din, em ji we ra serfirazi hêvi dîkin û em li bal we ne.  
bî navê

Komita Diji-İmperyalizmê û piştgirtiya  
Asiya, Efriqa û Emerikana Latin  
Peter Wahl  
Endamê Sekreteriyê  
(nêziki 60'i parti, rêxistin, rojname û kovar tê da dixebitîn)

## Mesaja Xwendekarêñ Protestan

Hevalên Grevkar ra!

Yên ji Kurdistanâ Tîrkiyê têñ,

Hevalên dîlsoz,

Em silavê dulgermin ji we ra rê dîkin. Wek hûn dizanin greva we li gelek hêlan ji aliye Yekitiya Xwendekarêñ Protestan da piştgirtiyê dibine, wek Wedel, Hamburg, Bremen, Frankfurt.

Bî taybeti zordestiyen Cuntaya Tîrkiyê leşkeri li ser gelê Kurd ser hev gelek caran em bî hevra protesto dîkin.

Li Rothenfelsê di konferansa nûneren me da me ev protestoya xwe ducarkir, wekiland.

Bî piştgirtiya xwe va em li bal we ne!

Yekitiya Xwendekarêñ Protestan  
li Elmania Federal û Berlinâ Rojava

# N PIŞTGİRTİYÊ

## Mesaja Parlementerên Elman

Jî Komita Greva Xwebirçihîştinê li hemberi zîlm û lê danêñ Kurdistana Tîrkiyê ra,

Lî Kurdistana Tîrkiyê jî ber mafêñ mîrovi pêpes dibin, em parlamenterên Elman piştgirtiya tekoşina we dîkin û vê yekê dîghinîne we.

Em pişta daxwazêñ we ne. Jî bo pêştakîşandına pîrsa Kurdan di Parlamentoya Elman da û ser vê pîrsê dan û stendin çêbin, emê kar bikin.

• Manfred Coppik	(SPD)
• Erich Meinike	"
• Karl Heinz Hansen	"
• Klaus Thusing	"
• Renate Schmidt	"

## Mesaja Serkarêñ TÖB—DER

Hevalên hêja,

Gelên Tîrkiyê di diroka mîrovatiyê da fasîzm di ciyê sekeratê da girtiyê û bî rûteniyîya wêva, wê sosret dîke, despêkîrîna greva we bo vê yekê di vê demê da zef gînngê.

Ev xebata we jî aliki da rûreşîya Cuntaya fasîst dadixe meydanê, jî aliyê ñim da li hemberi fasîzmê di tekoşina gelên me da wek serfiraziya hevgirtinê tê xuyanê.

Cunta di roja 12 İlône sala 1980'an vîrda li hemberi tevgera şoresseri-demoqratik li Tîrkiyê û li hemberi tevgera netewi-democratik li Kurdistanê dest bi erişke bi kûrêt kiriye, bi yêkê va ew dixwaze van tevgera tun-tubes ke. Bo vê yekê hemû azadi û mafêñ mîrovatiyê yêñ bingehin jî ortê rakîriyê, jî gelên me ra hêşrên çavan û eş - jan anîye. Ew jî aliki da lawêñ gelên meyê mîrxas dide ber gullan, tiji zîndana dîke, eziyeta li wan dîke, jî aliyê ñim da wê çav berdaye pari nanê gelên me.

Cunta bî hoviti li Kurdistanê emelên nediti tine serê gelê me. Ev bî deh salan heye çinêñ serdest li ser gelê Kurd zordesti, teda ûjenositêñ mezîn pêkanîn, disa jî gelê Kurd stû xar nekîr, niha jî dixwaze gelê Kurd yekten qırbiye. Cunta li ser gund, bajar û zomên Kurdan da digre û ezîyetan li Kurdan dîke, bî namu-jinan va dilize, malêñ gundiyyêñ belengaz jî destêñ wan digre. Cunta niha bî vana va jî namine û nahêle Kurd devêñ xwe vekin, zmanê xwe va bîpeyîvin.

Burjuvaziya yekdest li Tîrkiyê, bî rasti taqet ketiye, qels bûye, çavkaniya hoviti û har - dinbûna Cuntayê jî vir tê. Komên serdest jî bo vê sazumanâ xwe jî hilweşinê biparêzin, xwe disperê zordestiyê û lê danêñ xwe zêtir dîkin. Lê ew vala xwe ba dîkin û nikarin pêşiyê meşa dirokê bigrin. Gelên me civateke wusan dixwazin ku lê zordesti û kedxwari tunebe, ew nikarin pêşiyâ vê tekoşina daxwaza gelên me bibirin. Gelên meyê zehmetkêş wê bîghêjne rojêñ serketinê.

Bî navê karkerêñ hinkîrmê li Tîrkiyê vê berxwedana we da hetani dawiyê em piştgirtiyê we dîkin, dî tekoşina we da jî we ra pêşketin û serfiraziyê dixwazin.

- Bîmre Cuntaya fasîst!
- Biji Tekoşina gelên Tîrkiyê li hemberi fasîzm, imperializm û şovenizmê!
- Biji yekîtiya Karkeran, bratiya gelan!

Gültekin Gazoğlu Ayhan Kutlay  
Serokê giştî yê TÖB-DER'ê Dewsgirtiyê serokê TÖB-DER'ê

Tekin Üstün	Mehmet Yalçın
Endamê Komita	Endamê Komita
Bîrêvabırına Navbendi	Bîrêvabırına Giştî

Aydin Yeşilyurt  
endamê Komita Bîrêvabırına Giştî

## Mesaja Büroya Agahdariyê ya NIKARAGUA

Hevalên hêja,

Gelê Kurd jî bo dadimendiyê, azadiyê û aşîtiyê tekoşina xwe dajo, ev greva xwebirçihîştinê tekoşin pêşta bir, Büroya Informasyonê ya Nikaragua vê greva we silav dike.

Jî bo destxistîna azadi û dadimendiyê, şoreşa Nikaraguayê, şoreşa hêviyan baweriya xilasbûna bi riya berxwedanê va nişanî me dide.

Büroya Agahdariyê ya Nikaragua bî dîlgermi piştgirtiya hemû daxwazêñ grevkaran dike.

Destê xwe bidin hev li hemberi zîlm û zordestiyêñ li Kurdistanâ Tîrkiyê.

Büroya Agahdariyê ya Nikaragua

## Mesaja Kongra Yekîtiyê

Bî navê Komita Amadekirîna Kongra Xwendekarêñ Kurdistan li derwayî welat em Komelê Xwendekarêñ Kurdistan, piştgirtiya daxwazêñ we bî dil û can dîkin, silavê şoresseri pêşkêsi we dîkin.

Komita Amadekirîna Kongra Yekîti

(Komita Amadekirîna Kongra Yekîti jî wan komelê jêrin pêktê).

1. Komela Xwendekarêñ Kurdistan yên Pêşverû li Swêd.
2. Komela Kurdi li Swêd.
3. Komela Xwendekarêñ Kurd li Ewrûpa (Komita Amadekirîna Kongra 20).
4. Komela Xwendekarêñ Kurdistan li Derwayî Welat (AKSA, na-wend Wien).
5. Komela Xwendekarêñ Kurdistan li Derwayî Welat (AKSA, na-wend Berlin).

## Mesaja İG—METAL

Hevalên hêja,

Civina endaman giştâ ya Sendiçaya IG-Metall li Paderborn van hevalên ku greva xwebirçihîştinê destpêkîrine, em piştgirtiya van hevalên Kurd dîkin û em dixwazin ku alikariyêñ Elmanîa Tîrkiyê ra, rî dîke derhal bê sekînandin.

Sendiçaya IG-Metall  
Li Paderborn

## KESÊN KU PIŞTGİRTİYA GREVÊ KIRIN

Mirovên bî nav:

Mîetwekilî: Manfred Coppik, Renate Schmidt, Klaus Thusing, Karl Heinz Hansen, Erich Meinike, Freimut Dave, \* Helga Schuchhardt, Prof. Dr. Dorothee Sölle, Dr. Ingeborg Drewitz (avîskar), Cegerwin, M. Emin Bozarslan, Melike Demirag, Şanar Yurdatapan, Peygy Pamass (tojneşmaya), Karin Hauss (marmoste), Dirk Nordman-Bromberger (Hakim), D.R. Gefken (avukat), Prof. Jens Rohwer, Prof. Dr. Gerhard Stuby, Regine Wolfart, Rost-Wolf Almanasreh, Pastor Detlef Lüderwald, Petra Kelly (endamê Parlamentoya Ewrûpa), Jürgen Roth (tojneşmaya), Karsten Voigt, Heidemarie Wiecreroux (avukat, parlamentör), Pastor Dieter Hasemann, Prof. Dr. C. Schminke-Gutawus, Helmut Zander (endamê Unesco û kesîş) Dr. Hella Schlumberger (avîskar) û bî sedan kesên pêşvenî û demokratî.

# NAVÊN RÊXISTINÊN KU PIŞTGIRTIYA GREVÊ KIRIN

Ji bo serketina ve xebata greva xwebirîhiştinê bêşik rolke mezin ji bi sedan mesajen piştgirtiyê list.  
Em li jér navên réxistinênc mesaj mera şandi ú ji wana hûnkan ji bi xwe diweşinîn.

Partiya Sosyalist a Kurdistanê Turkiyê (PSKT), Partiya Demokrat a Kurdistanê Iranê (PDK-I), Partiya Demokrata Pêşverûyên Kurdistanê Suriyê (PDPK-S), Yekitiya Niştimanê Kurdistan (YNK) - Beşa Elmanyê, Eniya Şorîşvanê Demôqrat/Farabundo Marti û Tevgera Rizgariya Netewi FDR/FMLN - El Salvador, Buroya Agahdariyê ya Nikaragua beşa li Elmenya Federal, Federasyona Komelêna Karkerêna Kurdistan li Elmenya Federal - KOMKAR, Partiya Sosyalist a Şili, Bîrevabirina Giştî ya Partiya Keskan (Die Grünen), Partiya Keskan (Die Grünen) beşen Nürnberg, Rêxistina Hêla Bavyera, Beşen bajarêna Frankfurt û Gottingen, Partiya Liste Alternatif - Berlinê Rojava, Sekreteriya Komita Piştgirtiya Gelên Asya - Afrika - Amerika Latin û diji imperializmê - ASK (nêzkaya 70 rêxistin û kovar endamên wê hene), Partiya Demoqrati Gelê Kurd li Suriyê beşê Ewrupa, Partiya Sosyalist a Kurdistan (Komita Amadekir), Yekitiya Kurden Suriyê li Elmenya Federal, Riya Yekitiyê - Sempatizanêni Eniyê, Sempatizanêni Partiya Karkerêna Kurdistan (PKK) Partiya Komünistên Yewnanistan (ya hundiri) - Nurnberg, Bîrevabirina Komita Piştgirtiya Gelê Sahra, Bi navê Komita Piştgirtiya Gelê Sahra, Bi navê Komita Piştgirtiyê û Alikariya Turkiyê, Bi navê Komita Hevgirtina Xiristiyan - Turkiyê, Însiyatifa Piştgirtina Şili li Gottingen, Federasyona Komelêna Karkerêna Turkiyê li Elmenya Federal - FIDEF, Bîrevabirina Giştî ya Yekitiya Xwendekarêna Protestan li Elmenya Federal û Berlinê Rojava, Bîrevabirina Giştî ya Ciwanêna Sosyalist (JUSOS) yên Partiya Demoqrata Sosyal li Elmenya Federal, Bîrevabirina Giştî ya Ciwanêna Sosyalistên Elman - FALKEN, Yekitiya Xwendekarêna Sosyalist yên Xwendegehêna Bilind (SHB) - Bîrevabirina Giştî ya Federal, Ciwanêna Demoqrat yên Elman (DJD) - Komita Bîrevabirina Giştî ya Federal û li Berlinê Rojava, Forumê Navnetewi ya Komelêna Karkerêna Biyani (IFA) KBGF (Komita Bîrevabirina Giştî ya Federal) - (di nav da 19 komel hene), Komela Jinêna Elman, yên ku bî mîrên biyani va mîrkirine - KBGF, Komela Xwendekarêna Filistin li Elmenya Federal û li Berlinê Rojava, Serkarêna Federasyona Sendiqayêن Şoresger li Turkiyê - DISK, Serkarêna Komela Yekiti û Hevgirtina Hemû Mamosteyan li Turkiyê - TOB-DER, Karkerêna Xweşbûnê yên Katolik - KBGF li Elmenya, Yekitiya Xwendekarêna Kurdistan li Derwayê welat AKSA (li Berlinê Rojava), Rêxistina here bilind ya koma pirsên karkerêna Biyani - VIA KBGF, Komela Xwendekarêna Iran, Sempatizanêni Rêxistina Mucâhidîn Gel li Iranê KBG, Sempatizanêni Komela Fedayiyêna Gel li Iran (beşa pirani), Komita Avakirina Komela Jinêna Kurdistan, Komela Xwendekarêna Kurdistanê Pêşverû li Swêd, Komela Xwendekarêna Kurd li Ewrupê, Yekitiya Xwendekarêna Musîlman (MSV), Komela Gelên ku dî bin tîrsêdane - KBG, Xwendekarêna ji Turkiyê yên Demoqrat li Yekitiya Dewletên Ameriqayê (USA), Xwendekarêna Iraq li Berlinê Rojava KBG, Yekitiya Ciwanêna Sosyalist-İnternasyonal (IU), Komela Aşitiyê li Elmenya/Hêzên Ser naxwazên li Hamm, Komita Diji-Faşizmê ji bo Turkiyê li Stokholm, Federasyona Regevîn (izci) Elman (DPB) - KBG, Yekitiya Pêşverayêji Turkiyê li Ingilterê (ITIB), Komita Xebata Komelêna Karkerêna Biyani li Frankfurt, Komisyonna Biyaniyan li Bremen, Komela Xwendekarêna Karkerêna Yewnan li Bremen, Piştgirtiya Gelên Asya, Afriqa û Amerikanâ Latin li Bremen, Serokatiya Komela Xwendekarêna Universite Saarland, Komela Hemû Xwendekarêna Universitan (ASTA) beşen Dortmund, Frankfurt, Gottingen, Paderborn, Bremen, Dortmund, Duisburg, Konstanz, Nîrnberg subeleri, Yekitiya Xwendekarêna Marksist (MSB-Spartakus) beşen Paderborn, Bremen, Konstanz, Sendiqaya Zamîti û Hinkîrmê li Eyelate Berlin û beşen Nurnberg û Münih, Komita Xebata Internasyonalizm (IAG) li Berlinê Rojava, Însiyatifa Jinêna Demoqrat li Bremen, Diji-H-Blok, Komita Piştgirtiya "IRA" li Elmenya Federal, Komelêna Karkerêna Kurdistan (li Frankfurt, Münih, Nurnberg, Mannheim, Stuttgart, Köln, Duisburg, Dortmund, Wuppertal, Erlenbach, Konstanz, Bremen, Hamburg, B.Berlin), Komita Karkerêna Kurdistan (li Paderborn, Westerwald, Bad Windsheim, Northeim,

Schaumberg, Komela Karkerêna Kurdistan li Swêd, Li hemberi dijiminatiya biyaniyan Tevgera Bajarvani li Bremen, Komela Aşitiyê li Elmenya, Hêzên li Hemberi Şer li Frankfurt, Komela Karkerêna Filistin li Bremen, Komita diji-faşizmê li Turkiyê - Frankfurt, Sendiqaya Maden-Kar (IG-Metall) beşen Paderborn, Nixdorf, Sempatizanêni Tekoşin, Komita diji-neonazi li Nürnberg, Komita Xebata Aşitiyê li Konstanz, Cîvina Jinêna Elman li Yekitiya Sendiqayê Elman (DGB), Komisyonna Niviskarêna rojnema "Roja Nû" li Stokholm, Sempatizanêni Karkerêna Şorîşvan li Frankfurt, Komela Zehmetkeşen Kurdistan li Iran (Komeleh), Komela Karkerêna Turkiyê li Paderborn, Komela Karkerêna Xwendekarêna Kurd li Frense, Komele Demokratik ya Karkerêna Turkiyê li Norweç, Komita Spora Kurdan li B.Rojava, Mala Gelê Türk li Frankfurt, Proja Xebata Karkerêna Biyani li Berlin, Sempatizanêni Riya Yekitiyê li Dortmund, Komita Xebata Alikariya Pêştaçuyinê li Karlsruhe, Komela Karkerêna Kurdistan li Awustralyê, Komela Xwendekarêna Protestan (ESG) beşen Paderborn, Dortmund, Stuttgart, Bochum, Bremen, Gottinge, Aachen, Klaustal-Zellerfeld û Münih, Xwendekarêna Kurdistan li Kahire - Mîsir, Proja Dînya Sîsya ya Koma Turkiyê (FH-Ostfriesland), Ji bo Demokrasiyê Yekiti li Paris, Ji bo Demokrasiyê Yekiti Komita Ewrupa (Dusseldorf, Komela Aşitiyê li Elmenya beşen Bremen - KBG, Komita KOMKAR'ê li Bochum, Sempatizanêni Dengê Karkeran li Frankfurt, Berbursiyarê Xwendekarê Biyaniyan li Universita Paderborn, Partiya Komunista Elman (DKP) beşen bajarêna Altenkirchen, Bremen, Duisburg, Paderborn, Dortmund, Ciwanêna Sosyalist di nav SPD (JUSOS) beşen Paderborn, Adelebsen, Bremen-West, Westfalya Rojhîlat, Hêla Bavyera Başur, Nurnberg, Gottingen, Konstanz, Zeutlingen, Komela Zanineha Katolik li hêla Kuzen Ren Westfaliya, li Paderborn, Dijayetiya Hemberi Rejima Naziyan/Yekitiya diji-faşizm beşen Paderborn, Frankfurt, Bremen, Partiya Demokrata Sosyalista Elmenya (SPD) beşen bajarê Paderborn, Komela Karkeran li Münih (girêdayi Fidef), Ciwanêna Demoqratîn Elman (DJD), beşen Mannheim, Ciwantiya Sosyalist a Elemanya - FALKEN (SJD) beşen Frankfurt, Bremen, Nurnberg, Pîrûkxane Buchenkiste li Nbg., Xebatkarêna Çapxana Druckladen li Nbg., Xebatên ji bo Bexçeyen Zarakan li Nbg., Însiyatifa Elman/Yewnan li Nbg., Komela Karkeren İtalyan (FILEF) Nbg., Yekitiya Jinêna diji-Militari, Xebatkarêna Tiyatroya GOSTNER li Nbg., Komela Yewna li Nbg., Yekitiya Komunist li Nbg., Sixulwanêni Kinderladen li Nbg., Komita Emerika Latin li Nbg., Tevgera Gel li hemberi Çeka Atomê li Nbg., Sixulwanêni Komita Nivsarê ya Kovara Rosa Fieder, Piştgirtiya Jinan li Nbg., Yekitiya Pêşverûyên Turkiyê (HTIB) Hamburg, Yekitiya Xortan li Bremen, KPD - Komita Awakar, sempatizanêni Karkerêna Şorîşger li Bremen, Yekitiya Komelêna Ciwantiyê ya Eyaleta Bremenê (19 komel tê da dixe-bite), Komela Karkerêna Türk li ber dorê Bremen, Xorten Karke-reñna Sosyalista Elmenya (SDAJ) beşen Paderborn, sempatizanêni TKEP li Bingen, Komiteya Azadi li ber dorê Gronau, Karkerêna li Werlê, Însiyatifa Aşitiyê li Paderborn, Koma Dibistanêni Bîlinda Protestan, Organizasyona Efkirina Navnetewi (AI) beşen Frankfurt, Münih, Komela Karkerêna Çanda Kurdistan (KOÇ-KAK) - Wiyana, bi nave 19 komelêna biyani ku li Frankfurtê kardikin - Gruba Xebatê, Xebatkarêna AEG li Nbg., Xebatkarêna Xwendegehabilind li Bremen, Starvanêni (ilticayen) Greva Xwebirîhiştinê yên Kurd û Türk Mehringhof li Berlin, Multecîyen Kurdistan û Turkiyê li Atina, Sempatizanêni KOMKAR'ê ji Konyayê li Mainz, Serokatiya Konseya Yekitiya Xwendekarêna Teologiyê, Yekitiya Ciwanan li Mannheim, Yekitiya Xwendekarêna Katolik li Gottingen, Komita ji bo Parastina Mafêni Mirovayı li Turkiyê (New York - Los Angeles - USA), Tevgera li hemberi Nijadperestiyê (AAB), Komita Turkiyê li Frankfurt, Koma Dînya Sîwemin li Frankfurt, Komita Nikaragua li Frankfurt, Redaksiyana Rojname "Wir" Em bajarvanêna biyani li Frankfurt, Komela Doxtorêna Kurd, Komita Avakirina Komela Jinêna Kurdistan, Komela Çanda Efrikê, Komela Gel li Köln.



# PIŞTGİRTİYA İNTERNASYONAL

Hevalên ku grevê da ci girtin, di meşa grevê da berdaninê xwe yên internasyonal ji birnekîrin, xebatên wan bî tehreki piştgirti û alikariyê va hatin xemilandin. Ji van xebatan hevakan vi tehri em dikarin rêt bikin:

- Lî bajarê Hanau şeva ku bî navê "Seva Aştiyê" hat çêkirin, grevkaran mesajeke piştgirtiyê şand, xwendina mesajê dî nav besdaran da hêwirzeke mezin vekir.
  - Çawa tê zanin li bajarê Berlin ji bo mafê starbûn (Asyl) çend karkeren Türk û Kurd çûne grevê. Grevkarên Frankfurtê ji bo piştgirtiyê ji wanra mesajek rêkîr.
  - Lî bajarê Frankfurtê ser rewşa iroyin li Iranê çend komên politik şevez çêkirin, ji vê şevê ra grevkaran mesajek şand û xwendina mesajê guhdarîke mezin dit.
- Dî meşina ku li hemberi firekîrîna balafrîgeha bajarê Frankfurtê hate çêkirin, bî navê grevkaran dî vê meşinê da nêzkaya 15 hezar belavok hatin belavkîrin. Xêن ji vê, ew kesen ku ev meşin sazkaribûn, ji wana komek hat li ber derê cihê grevê ra derbaz bû, ji bo piştgirtiyê û ji bo hinbûna da xwazên grevkaran hevaleki bî navê grevkaran li ser piya 15 deqe ji wan ra deng kîr.

## PIŞTGİRTİYA MELİKE DEMİRAX

Dengbêj Melike Demirağ û mîrê wê Şanar Yurdatapan, cara pêşin mesajeke piştgirtiyê şandin û paşê ji Melike Demirağ bî xwe hat şuna grevê ziyaret kir û piştgirtiya xwe li gel grevkaran va hin ji ta birin. Wê ser grevê kurt peyiî u li şuna grevê du ji klam gotin.

Piştgirtiya van senetkaran di warê piştgirtiya internasyonali da gaveke fireh bû. Ev gavêñ di vê tangê da têñ avitîn bê şik tekoşina gelên Türk û Kurd hin ji xurttir dîke, bo wê yekê ku dijmînê van herdû gelan ji yeke.

— Komita Piştgirtiya Gelê Sahra Rojava di nav van rojan da şevez çêkirin. Karkeren KOMKAR di vê şevê da besdarbûn û mesaja grevkaren Kurd gîhandine wan. Xwendina mesajê va çapîk li ser çapîkan hatin kustandin û bî kîfxweşike mezin va mesaj hat guhdarkîrin. Dî nav mîvanen şevê da nûnerê POLISARIO û geleksî kesen din ji ci girtibûn. Wan ji ber piştgirtiya karkeren Kurd ew piroz kîrin.

— Ev demeke dirêje jineke Elman û dersdareke pêşverû bî navê Brigitte Heinrich ji aliyê hukumeta Elman da zordestiyen mezin dibine. Ji ber vê yekê li Zanineha Frankfurtê ji bo piştgirtiya Brigitte Heinrich şevez hat çêkirin. Ji şevê da mesaja grevkaran hat xwendin û bexşis hat dayin. Paşê Brigitte Heinrich ji bî xwe hate cihê grevê û piştgirtiya xwe li gel grevkaran nişan da.



## ROJA KUTABÛNA GREVÊ

Grevâ ku 23 karkeren Kurd beri 41 rojan destpêkirbû bî civineke mezin va kutabû. Piraniya daxwazên grevkaran hatin cih û bî kurti ev greva 23 karkeren Kurd bî serfirazi derbaz bû. Roja kutabûna grevê, karkeren Kurd bî hevra cûn li aşxana KOMKAR'ê cara pêşin şorbeke germ vexwarin. Paşê civinê destpêkir.

Dî destpêka civinê da, hevalek bî navê Komita Greva Xwebîrchiştinê ser serfiraziyen grevê peyiî û wi axaftina xwe da dûr û dirêj li ser grevê sekini.

Paşî xeberdana vi hevali, ji nav grevkaran hevaleki karker ijar derket peyiî. Ew ji bî kurti ser grevê, daxwazên xwe û li ser piştgirti û alikariya hêzên demoqrat-pêşverû sekini. Ji ber vê piştgirtiya germin, heval spasdariyê xwe gîhande besdar û mîvanan. Wi di keriki xeberdana xwe da got ku "greva me kutabû, lê tekoşina me hetani Kurdistanê azad û demoqratik avabe, wê bajo".

Pey van axaftina filmek li ser Kurdistanê hat nişandin. Televizyona Elman

(WDR) ev filma di dema grevê da kışand û vi filmi niv seet kışand. Ev greva ku 41 rojan ajot di vi filmê da ciki fire girt.

Dî keriki programa civinê da sazbend Kamil û Bêrti derketin çend klam - stran pêşkeşî mîvana kirin. Dura mîvan, grevkar û besdarên civinê bî hevra govend girtin.

Dema ku civin kutabû, grevkar bî rûken li ciyê grevê derketin, herkes berbi hêla xwe rêket. Ji bo kar û xebatên nû û ji bo tekoşinê hîviya wanin...

# ERİŞEN MAOCİYAN LI MANNHEIM

Dî roja şemiyê 5.12.1981 li bajarê Mannheim dema ku hevalan li ser greva xwebircihîştinê belevok belavdikirin, maociyan êriş du karkerên Kurd kîrin. Ji "Devrimci Halkın Birliği" û "Halkın Yolu" çend kesan "hûn vira nikarin belavoka belavkîn" gotin û pêşî li hevalan girtin. Paşê dema ku ditin ev gef - gurên wan kar nakîn, ijar wan bî deh kesan va karkerên KOMKAR'ê dan ber xwe, kutan.

Kesên ku ali burjuvaziya faşist û li aliye hêzên paşverû nagrîn pêvîste li ser vê êriş kur - hur bîfikire. Li Swêdê faşistên nû (neo faşist) êriş birine li ser grevkaran, disa li Elmanya Federal faşistên Türk karkereki endamê KKDK kuştun, ji wana du kes ji birindar kîrin, di demeke awakîri da maoci pêşkari belavkirina belavkîn hevalan dibin û wan dikutin.

Ev gelek salin maoci dî bin kirasê şorîşvaniyê da li pêşîya hisyarbûna gelê Kurdistanê bûne asteng. Ew vir - derewan dikin, riyen şaş nişanî gel dîdin, bî devê burjuvaziyê va ew nav-nuçka li vê hisyarbûna gel dikin û tekoşina netewi-demoqratik qels - sist dikin û ev yeka ji hêzên kevneperest ra dest dide.

Nîha ji ev hêzên çewt, xelet û hevalbendê wan ji ber bilindbûna tekoşina gelê me şas-metal mane, li hev têñ-dicin "ev şuna meye" dibêjin bî hisê xwe diwxazin "warêñ azad" pêkbinin, lê ew xwe dixapin.

## GREVKARAN ERİŞEN FAŞİSTAN PROTESTO KIR



Paşî erişen komandoyen faşist endamê KKDK'yê Xelil Yıldız hate kuştin û du kes ji birindar bûn. KOMKAR ser vê yekê piştgirtiya KKDK'yê dîkir.

Grevkaran xwebircihîştinê paşî kuştuna Nezih Şekerji bo biranina wi deqeqê berêzbûn û belevokek derxistin, di belavokê da ev erişa faşistan hat protestokin. Grevkaran ji perê wan suretên çêkîribûn û frôtibûn 500 DM girtin dane malbatu vi karkeri.

Disa dema ku delegasyonê grevkaran bî Konseya Ewrupayêva dipeyi; usa ji ser vê hovitîyê sekini, Komisyona dadi-mend paşê li ser vê bûyerê ji hevalan agahdari xwest.

# NAMEK JI DU ZAROKÊN KURD

Ordiya Türk ya faşist li Kurdistânê li ser gelê me zordesti û lêdanê mezîn pêktine. Ev zordesti roj bî roj zê tur dibe.

Lî hemberi van zordesti û lêdanê me bihist ku li bajarê Frankfurtê 23 karkerên Kurd dest bi greveke xwebircihîştinê kîrin û paşî 41 rojan ev grev bi serfirazi kuta bû. Nûçeyen li ser despêkîrina ve grevê di hejmara 36, Dengê KOMKAR'da me gîhandibû xwendevanên xwe.

Min xuška xwe Tûlay me zef dirxwast em tevi vê xebata weye serfiraz bîbin. Çi bidne me, em dîkarîn binin cih û em hertim li bal wene.

Em ji grevkaran xwebircihîştinê û ji hemû hevalan ra serfiraziyan dirxwazin.

Gelê me wê serkeve!

Silav ji kesen, ku zindanan da eziyet û lêdanê divinîn!

Silav ji hemû gelê me ra!

Tûlay û Xuzur  
ji bajarê Dortmund

## WUPPERTAL

Ji bo piştgirtiya greva Frankfurtê, bî saya xebata endamên Komela Karkerên Kurdistan li Wuppertal komita grevî hate pêkanin. Dî vê Komitê da papazeki dêra Protestanan, berpirsiyareki MSB (Yekîtiya Xwendevanên Marksist), mamosteyeki Dibistana gel ya bîlînd (Volkshochschule) û berpirsiyareki ESG (Komela Xwendevanên Protestant) ci girtin.

Komitê ji derê nivisin, çapkirin û belevkirina 3000 belavokêni bî zmanê Elmanî usa ji bî hezaran belavokêni ku ji aliye komita navce (merkezi) da hatîbûn çapkirin di nav gelê Wuppertalê da belavkir, bî sedan plakat zeliqand.

Dî roja 3.12.1981 da 5 endamên KKK li Wuppertal ji wana sê kes mîr di du ji jin bûn - dest bî greva xwebircibûnê ya ji bo piştgirtiya greva Frankfurtê kîrin. Grevê sê roj dom kîr. Grevê, bala meri û komelén demoqratik kışandê serxwe.

Dî wextê berdewamkirina grevê da Komela Karkerên Kurdistan li Wuppertalê civinekê vekiri pêkani. Di civinê da armanca greva xwebircihîştinê hate eş-kerekirin û kampanyekê abori hate vekirin. Di dawiyê da 1000 DM'i zêtir pere hate komkirin.

Şeva kutabûna grevê da, dî dêra protestan da seminerek li ser Singapurê di-hat dayin. Dî wê seminarê da keşîn (papazên) dêrê ji bo şehidên Kurdistan du'a xwendin.

# Ji Dengê KOMKAR

Xwendevanên delal,

Ev hejmara "Dengê KOMKAR" ku niha destê wedaye ji bo vê hejmara me bi Kurdi û bi Türkî cûda çapkuriye. Hejmara din emê wek berê bi Kurdi û bi Türkî tev-lîhev çap bikin. Ev rê me çîma bijart?

Çawa tê zanin di mehê çûyida li bajarê Frankfurtê, li Elmanya Federz! 23 karkerên Kurd dest bi greveke xwebircihîştinê kîrin û paşî 41 rojan ev grev bi serfirazi kuta bû. Nûçeyen li ser despêkîrina ve grevê di hejmara 36, Dengê KOMKAR'da me gîhandibû xwendevanên xwe.

Ji ber firebûna nîsîr û nûçeyen li ser vê grevê û ji bo agahdariya xwendevanen li ser xebatê bas pêkbê, me ev hejmara Dengê KOMKAR bi kurdi û bi Türkî cûda wesand. İro geleç xwendevanen me hene Türkî zanin lê Kurdi nîzanin, disa hînek xwendevanen me ji hene Erebi, Farisi zanin, lê Türkî nîzanin. Ji bo ortê rakirina vê tengasi û dijwariyê me ev hejmar bî vi tehri derxist. Wek me jorê ji got Dengê KOMKAR berê çawa derdiket, wê virşunda ji wusan derkev. Xwendevanen m' vê hejmara Dengê KOMKAR bi çapê. Türkî û Kurdi hevra dîkarîn bîstîn an ji dîkarîn çapeke wê tenê bîstîn.

Ji bo vê guhastînê em bawer dikin ku hunê me biborîn. Bi silavên germin.

Redaksiyon  
Dengê KOMKAR

Hejmara belevokêni hatîn belavkum:

• 395 000

Hejmara plakatên hatîn zeliqandin:

• 15 000

Hejmara têxistinê piştgirtiya me kîrin:

• 285

Hejmara alîkarîyan bî pereti :

• 25 000 DM.

Hejmara rojhîmîn şu n dane grevê :

• 115

## ŞUNA GREVÊ ŞUNA XEBATÊ BÜ

23 hevalên grevkar di şuna grevê da, dema ku grevê dajot, ew vîk - vala neman. Meriveki şorîşan li kiderê dîbe bîra bîbe, pêvîste bixebite, grevkaran bî vi bawerîyê va gelek kar kîrin. Ser vê yekê cûre - cûre xebatê çandi wan pêkani û efrandin. Di grevê da hevalên grevkar gelek şîkl - sûret, wêne çêkîrin û ew raberi ziyarekaran kîrin.

Karkerên grevkar, bî mîvanên ziaretvan va xwina wan keliya ser hev û bûn yek. Wan bî hevra govend dagerandin, deng didan hev û bî hevra klam - stran gotin.

Disa di şuna grevê da karkeran gelek pirtük - kitêb xwendin, li ser gelek pîrsan di nav xwe da dan û standin çêkîrin û hev birin - anin. Hisyari, serwexti û têgîhistîna wan di nav vê grevê da him ji pêşta çû.



# KARÊN PIŞTGIRTİYÊ LI WELATÊN MAYİN

## FRENSE

Lî Frensê karkerên Kurd belevokên ku li ser grevê derketibû, bî tehreki fire belavkirin. Wan ev belavokana wergeran-dine zmanê Frensi û mirov - şê niyê Frenseyê ser daxwazên grevkaran hatin agah-dar kîrin.

Çawa li greva Swêdê, usa ji Frensê faşistan xwast ku êrisê bibne ser karke-rên Kurdistanê. Ewêni bî navê musliman-tyê karkeran bi vir - derewan va dixapi-nin û ji bo MHP'ye propagandê çêdikin dixwazin ku karkeran beri hevdin. "Weki em rastiyê bizanbin, emê ji li hember der-kevin, evana gişk File (Ermeni) dikin" bî vi tehri ewên hebûna gelê Kurd inkar di-kin û haj li Kurdistanê tunenin, dîl kirin su pêşiyê li hevalan bigrin, weki ew be-lavoka belavnekîn.

Ewêni ku dicin Kurdistanê, bî çavêni xwe va rewşa Kurdistanê baş dibinin. Lê ew dijminê gelê Kurdin û ji ber van zordestiyan ew bî rasti niha şâ dibin. Lê cû-retê wan tune vê yekê bî servekiri bêjin. Ew bî vir - derewan va dixwazên dora xwe çend se - kûçika bîcivinîn.

Faşistên MHP'ye bî dek û dolavan va dixwazin karkerên Türk û Kurd beri hevdin û dubendiyê navbera wanda pêkbinin. Lê édi karker guh nadîne dêrewêni wan û êdi ew hisyar bûne. Karkerên Türk xwe ji zordestiyêni li ser gelê Kurd naxwazin. Ew zanîn Cunta dijminê wane. Karkerên herdu gelan brayê hevin û ewên zordesti-yê li wan dikin, yekin.

**DELEGASYONEK  
KONSEYA EWRUPAYÊ  
ZİYARET KIR**

Nûnereki bî navê karkerên grevkar çû li bajarê Frensê - Strassburgê Konseyaya Ewrupê ziyaret kîr. Lî ser daxwazên grevkaran ev nûner li dewsgirtiyê Sekreterê Giştî yê Konseyê, berpirsiyaren Komis-yona Dadigehi - Politik û bî serokê Ko-misyonâ Tîrkiyê va peyivi û hevditin. Nû-ner li ser rewşa Kurdistanâ Tîrkiyê sekimi û li ser Kurdistanê çend dokument girt da wan. Hat xwestin ku Tîrkiye ji nav Konseyê pêviste bê avitîn.

Disa ji gelek komêni parlamenteinan va, li hêla Alson Toren bî nûnerên PKF û bî nûnerên Sendiqayê vê hêlê CGT û CFTD va delegasyona grevkaran gihiştin hev û hevra peyivin.

Pasê ew delegasyonê ku çu Parisê gelek kesen mafêni mirovan diparêzin bî wanra, zane, rêxistinê politik û rêxisti-nê netewi û navnetewi va peywendi pêk-anî û ew bî hevra li ser rewşa Kurdistanâ Tîrkiyê sekînin.

Hemu ev yekana li Frensê ji bo da-naskirina doza Kurd di nav van rojan da bûn xebatne pîr giring. Hemû ew mirov û rêxistinê ku hatin ziyaret kîrin haj bi

pîrsa Kurdan hebûn. Hemûyan da kîvşê weki li dinê tu gel tunîn ku wek gelê Kurd di bin barê giran da maye. Disa wan diyar kir ku li hemberi van zordestiyan wê karên xwe bajon.

Disa bî nûçegihanê rojnema Le Mond û redaktorê rojnema 'Nouvel Alcase' peywendi hatin pêkanin. Li bajarê Parisê di navbera delegasyonê grevkaran û nûçegihanê Le Mond da hevpeyyinek çêbû û paşê dijwari, tengasi û zordestiyêni li ser gelê Kurd hatin nişandin. Dura ji bo rojname agahdari û dokumentên berbiçav hat dayinê.

## BELÇİKA

**DELEGASYONEKİ DIN  
BI PARLAMENTOYA  
EWRUPAYÊ VA DENG KIR**

Lî ser daxwazên kesen ku çûne grevê, Parlamentoya Ewrupayê delegasyonek ga-zî Brûkselê kîr. 3 kes ji grevkaran va ew delegasyon bî dewsgirtiyê serokê Parlamentoye va deng kîr û Yekîtiya Sendiqayê Ewrupayê ziyaret kîr. Ew li ser Rewşa Kurdistanê sekînin û delegasyon çend dokumentên berbiçav girtin dan wan. Paşê delegasyonê xwest ku ji ber zordesti-yen faşista Tîrkiyê pêviste cezaki bibine.

Ji aliye din hevalen grevkar çûn seri dane komela 'Yekîtiya Dadimendê Demokratik a Navnetewi' û bî sempatizanen 'Têkoşer' va deng kîr. Disa niviskar Doğan Özgûren û grevkaran hevdî ditin û demekê li ser pêştaçuya grevê peyivin. Bi kurti ev seridana 'Parlamentoya Ewrupayê' bî serfiraziyê derbas bû.

## AVUSTRALYA

Komela Karkerên Kurdistan li Avustralya wextê xebera grevê bîhist, hema di cida telefoneke vekîrin û derheqa grevê da agadari xwestin. Karkerên Kurd yên ku li Avustralya dixebeitin, di her awayi da ji bo ku dengê grevkaran li Avustralyê belavkin xebaten kérhati bî cih anin, ji derê belav-kirna belavok û serdana komele û meri-yen pêşverû usa ji di warê abori da alika-riya grevê kîrin û 1000 DM pere ji komita grevê ra bî rê kîrin.

Dî keriki mesaja ku ji grevkaran ra hatiye şandin da tê gotin ku:

"Hevalen Kurd, em tekoşina we ji bo gelê Kurd piroz dikin; serketin û dîlşabû-na we ji dil hêvi dikin. Em dixwazên hûn bîzanibin ku em bi dil û bal bî hevalen hêja ra bûn, yên ku rûniştina birçibûnê hanin cih. Em ji bo wan hevalan alikarik abori tev vê namê rêdikin û hêviya me ewe ku armanca wan hevalan hatibe cih."

*Hevalno*

Her bangeke we  
Bû hezar bang  
We heval hejandin  
We heval ciwandin

Her rojek birçibûna we  
Dîbe banga mîzgeftan  
Dîbe çanga kîniştan  
Bo dayikan  
Bo zarokan

Birçibûna we  
Mîzgina bîharê ye  
Stîrka sîbê ye  
Bo têkoşeran  
girtian  
bîrindaran

Birçibûna we  
Pêleke ji pêlên raperine  
Mîsteke ji lêmiştâ serketinê  
Hûn 23 çakûçin  
Lî ser zincirên welat  
Hûn 23 kulmin  
Dî rûyê êrişvanan da  
Hûn 23 gulene  
Dî singê dijiminan da

**GUNDI**

## NAMEK JI KEÇEKE ELMAN

Braderen delal,

Ez di roja 28'ê grevê da hatim li bal we. Dema ku min hûn ditin kela dile min zef bîlind bû. Di tekoşina we da sergiramiya we baweriya min xurittir kîr, xina min li ser we keliya, lê sed heyf tene min destê we givaşt, weki din min nikaribû tişteki din bikura.

Ez bî baweriya xwe ya li bal we me, hêviyên min ji bo we hemûyan û ji bo me hemûyan.

Ez bî silavén here germin va we piroz dikim.

**Martina Zimmermann  
li Bingerbrück**

# Jİ BO GREVÊ CI GOTIN ?

"Grevkaran klama li ser berxwedana Amerika Latin hatiye stran 'Wenceremos' (Eme serkevin) bi zmanê dayka xwe digotin, ew nexâşbûn û bedhalbûn lê disa bawerîya xwe diparastin" (Ji ditinê rojmemevanê TAGESZEITUNG -bi zmanê Elmani derdikeve).

## ROJNEMEN BIYANI

Greva xwebirçihîştinê ku bî serfirazi ji aliye 23 karkerên Kurdistanê da destpêkrî, di nav 41 rojan da ajansên nûçan yên mezîn ev greva bî teleksan va gihanîn hemû cihanê: "23 karkerên Kurdistanê ji bo protestokirina zilm û zordestiya li Kurdistanâ Tirkîyê û ji bo balkışandina cihanê dest ti greveke bê dawi kîrîn" ajansan cara pêşin ev yeka weşandin. Disa armancîn vê xebatê, zordesti û lêdan û daxwazêni grevkaran ji di nav van deng û behsan da bûn.

Di roja 13.11.1981'an da rojneman ijar ev nûçê weşandin: "Di roja 2.11.81'an vîda li bajare Frankfurtê 23 karkerên Kurdistanê ketine grevê û ji bo piştgirtiya daxwazêni wan gelek karkerên Kurd ji bo alikariya hevalen xwe dest bi grevên 3 rojan kîrîn". Paşê sernîvisarênu nûçeyan bî vi tehri bûn: "Niha ji Stuttgartê", niha ji "Li Duisburgê" paşê digotin: "Niha ji Dortmundê" û paşê serda zê dedikirin rojneman: "Karkerên Kurdistan li gelek hêlan ji bo piştgirtiya grevê Frankfurtê ew ji çûne grevê".

Grevê piştgirtiyê her cû zêde bûn û vê yekê di rojneman da ciki fire girt. Mesele li ser greva Nürnbergê rojneman nivisin: "9 Kurd û 3 Elman ji bo greva ku ji roja 2.11.1981'an vîda li diji zilm û lêdânen li Kurdistanâ Tirkîyê li bajare Frankfurtê dajo, dest bî greva piştgirtiyê kîrîn". "Grevkaran klama li ser berxwedana Amerika Latin hatiye stran 'Wenceremos'" (eme serkevin) bi zmanê dayka xwe digotin, ew nexâşbûn û bedhalbûn lê disa bawerîya xwe diparastin" (Ji ditinê rojmemevanê Tageszeitung -bi zmanê Elmani derdikeve).

Rojneman ne tenê li ser grevê, úsa ji deng û behsîn li ser rîhildana grevê weşandin. Ji van nûçeyan çend heb: "Di roja 18'ê grevê da berxwedana Kurdan nehate şkandin", "29 rojên grevê kuta

bû, lê grev dajo", "di 33 rojên greva xwe da Kurd bawerîya xwe diparêzin".

Ji bo serfiraziyê grevkaran û cihanîna daxwazêni wan ji rojneman dînîvisin ku "Kurd gihiştin çend daxwazêni xwe. Sibê bi grevkaran va tevayî delegasyonek li ser gaziya Konseya Ewrûpê dice Brûkselê", "Grev ber bî serketinê dimeşe", "Daxwazêni karkerên ku ev meheke grevê da ne yek - yek têc cih", "Hettani niha nêzkaya 200 rexistin, gelek parlamentler û kesen navdar piştgirtiya grevê dike".

Di roja 14.12.1981'an da rojneman: "Karkerên Kurdistanê greva xwe bî serfirazi kuta kîrîn. Komisyonâ ku wê here Kurdistanê dest bi tîvdarekê xwe dike, Konsey û parlamento ya Ewrûpê bî delegasyonê Kurdan va hev ditin. Ser pîrsa Kurdan di parlamento ya Elman da wê dan û stan çêbe", belê hemû ev deng û behsan serketinê grevê û bî serfirazi kuta-bûna wê li hemû cihanê belevdikirin.

Grevê usa ji di rojnemên Ewrûpê da ciki fire girt, me ev yeka gotibû. Mesele li cihanê rojnemeke navdar "Le Mond" di roja di hejmara 9.12.1981'an da ser grevê bendek nivisi û hurgili li ser grevê sekini. Rojnemên Swêd, Norweç û gele-kên mayin ji şun dane grevê.

## CIVİNÊN PRESSÊ

Di nav 41 rojan da 3 caran civinê pressê çêbûn. Di destpêka grevê da li Frankfurtê, paşê li paytexte Elmanya Federal - Bonn'ê û carke din yek disa li bajare Frankfurtê çêbû. Ji bo van qivinan pressê wek 60 rüpelan dokument û sûret li ser zilm û zordestiyê Kurdistanê hat amadekirin. Di civina Bonn'ê da wekilmîleten SPD Coppik û Thusing, keşîş Helmut Zander, KOMKAR, Konseya Birêvabırina Federal ya Xortê Elmanê Democrat, FALKEN-Birêvabırina Giştî, ji grevkaran 3 kes, doxtoreki Kurd ku piştgirtiya wan dike û gelek rojnemawan, nûçegihanê ajansan beşdar bûn.

Di vê civinê da Coppik û Thusing: "Ev greva karkerên Kurdistanê xebatêke bî heqe. Li Kurdistanê hertim zordesti heye. Lê paşî cuntaya fasist ev zordesti hin ji zê tir bûne. Ez û hevalen xwe zordesiyen li Kurdistanê emê binin di parlamento ya Elmanî da têxîn pîrsa rojê. Ev xebata grevkaran balkışandina cihanê û berpîrsiyaren politik li ser Kurdistanê carke din agahdar kîr. Ji bo cihanina daxwazêni grevkaran emê bicedinin. Ez dixwazum greva hevalan ewqas dirêj nekşîne û nexwaş nekevin. Bo vê yekê emê ka bikin" gotin.

## RADYO - TELEVİZYON

Di destpêka grevê û di dema grevên piştgirtiyê dajotin, li her seetê carekê radyoyê Elman ser grevê nûçê didan bîhistin. Di programa Televizyonâ "Hessenschau" da wek 6,5 deqan li ser daxwazêni grevkaran û li ser zordestiyen Kurdistanâ Tirkîyê programek hat amadekirin. Paşê televizyonen WDR li Dortmund, Bremen û li Duisburg deng û behsîn grevên piştgirtiyê weşandin. Di dema greva Bremenê televizyonê programeke 3 deqan çêkir. Bi grevkaran va hevpeywinêk û helbesteki KEMAL BURKAY bî navê "serhîdan" bî Almani hatin xwendin.

Televizyonâ WDR li pêşengiya amadekareki filman va, ev kes keseki navdere, bî hevalen xwe va 4 rojan li şûna grevê man û film kişandin. Ev filma paşê di nav niv seetê da bî programekêva hat nişar din. Di film da lêdan, kutan û qırkınnê li Kurdistanâ Tirkîyê û daxwazêni grevkaran bi tehreki baş va hat pêşkêş kîrîn. Bi hezaran mîrov ev programen cûda-cuda mîzekirin. Ser nişandina van filman hêzîn fasist û kolonyalist har û din bûn ku çend rojnamên paşverû qîryan - qîyan. Tevhîhevdanê xwe zêtir kîrîn. Wan tîs firandin, lê nafile... Hün ci bikin - nekin gelê me diji û tekoşina wi dajo.

Sertîn salawexti: 6 mehi 10 DM, sali 15 DM.  
Âbone şartları: 6 aylık 10 DM, yıllık 15 DM.

Hesap-No: Postscheckamt Frankfurt  
Konto-Nr. 405767 - 606

Xwedi Sahibi ► Federasyona Komelên Karkerên Kurdistan li Elmanya Federal

Navîşan: 6000 Frankfurt, Westendplatz 34, Federal Almanya

Berpîrsiyar ► A. Saydam  
Sorûmlu

**IMPRESSUM**  
Herausgeber: KOMKAR  
Föderation der Arbeitervereine  
aus Kurdistan in der BRD  
Verantwortlicher Chefredaktuer:  
A. Saydam  
Druck: Eigendruck